Dumahîk : Kurd û ...

xuyankirine .

Ji mafên me yên netewî û rewa di çarçewa yekîtiya Sûriyê de bê par kirine û zimanê dê li me qedexe kirine . Bi ser de jî gelek pirojeyên awerte mîna (Kembera erebî û serjimar awerte) di dermafê gelê me de pêkanîne û hepis û zandanên wan jî , ji xebatkarên Kurd vala nebûne . Em ji bîr nekin jî , rewaya berevaniya Tevgera Kurd li Sûriyê ya yekemîn , bi destxistina wan mafên netewî , rakirina zulm û zorê û gihandina gelê kurd li vî welatî ra azadiyê ye .

Ji alîkî din ve jî , piştî ev guherînên demoqras ku , li rojhilata navîn çêdibin û şerê terorîzmê yê ku ji aliyê malbata navnetewî ve tê kirin wek : Roxandina rijîma Talban li Afgastanê , rijîma Sedam Husên li Îraqê û berzbûna doza Kurd li wir û qewtandina ordiyên Sûriyê ji Lubnanê û dozkirina serxwebûna wê ji bin lepê Sûriyê bi darê zorê piştî kuştina Refîq herîrî .

Li gel wê yekê hundirê Sûriyê ji hemî aliyan ve jî civakî , aborî , çandî , demoqrasî , dezgeh , rêzanî …..H.W.D , di bin siya rijîma be'is ya şoven (Partiya tekane) her diçe bi şûn ve û berve hilweşandinê dere .

Di vê rewşa kambax de , piştî dan û standinek kêm zêde di navbera Hêzên rikber ji rijîmê re di Sûriyê de û T.K li gel wan (Hevbend , Enî û paşê jî wîfaq) , gihîştin baweriyekê ku nema rijîma Sûriyê dikare guhartinan di hundir û siyaseta xwe ya derve de çêke . Ew her diçe dûzana xwe jî şaş dike û dihêle ku malbata navnetwî bi serokatiya Emerîka zorê bide ser û wek rijimek teror û ne aştiyane bi nav bike .

Ev wêneya heyî hîşt ku belgeya îlan dîmeşq ji aliyê rikberên Sûriyê ve çi kurd , çi Ereb ….. H.W.D derbiçe û jiyanê bibîne û ciyê balkêşiya hêz û xelkê Sûriyê be . Mirov dikare bibêje ku , ev blgeya, belgeyeke lihevkirinî û cara yekê bû li ser riyek rast di nav hêzên rikber di Sûriyê de ye , çi kurd , çi Ereb û çi Aşor . Vê hîşt mirov pê dilxwaş bibe û hêviya berdewamiyê , serkeftinê jê re hêvî bike .

Ji aliyê naveroka belgeyê ve , yê ku hîştî mirov pê şabibe . Guherînek demokras û dadmend ji rijîma Sûriyê re, û pejirandina geşkirinek doza kurd re , di Sûriyê de .

(Di hundir wê de mafê cinsî , mafê fêrbûna zimanê dê , wekheviya mirovê kurd bi hemî hemwelatiyên din re û mafên din yên rêzanî , çand , civak , destorî ……..)

Raste tiştên cî girtine ne li gor hêviya gel û tevgera kurd û bernameyên wan bûn . Lê me dilê xwe xweş dikir ji ber ku , weke me di destpêkê de gotibû ev belgeyek lihevkiriniye û ne li gor daxwaza hemî hêzên ku , li ser îmzekirine ye .

Lê, piştî ku , hin helwestên nerazîbûnê ji aliyê hin partiyên kurd ve (Azadî-Yekîtî…..) hewldana berpirsyarên hin hêzên Ereb yên ku li ser belgeyê îmzekirine mîna Riyad El Turk , Hesen Ebdilezîm û Elî Sedir Eldîn Elbiyanonî (Ixwan Elmuslîmîn) ku ji tiştî di belgeyê de di aliyê doza kurd de hatî vegerin û li gor xwe şirove bikin ku çareserkirina doza kurd li Sûriyê em di hemwelatiyê de têdighên . Daxuyana ku li vê dawiyê ji aliya komîta ragihandinê û belge şirovekirî û hin armanc û hêviyên hêzên Ereb yên netewperest lê zêde kirî xuya dike çiqas nûnertiya tevgera kurd di komîtê de jar û qelse , ne li heve û zû dişimite .Tu xêz sor li pêş wan tune ne û nêrîna T.kurd ne zelal e . Ji ber wê pêdivî îro berî sibe heye ku , T.K li hev bicive , nêrîna xwe bi kêmanî di dermafê çaresekirina doza Kurd de li Sûriyê zelal bike û şandeke li hev , bo vê komîtê vebjêre , da ku li dor me ne îro û ne jî sibe tu zîvrandin çênebin , em li gor hêviyên gelê xwe bin û tu cudatî di navbera tevgera me de jî çê nebe .

Memê Alan